

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 138) Sal 23 20 Tîrmeh 2018 z - 2630 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S


# Hilbijartinên Turkiyê ... Paşerojeke ne diyar



## Desteya sernivîser

Li seranserî Turkiyê û Kurdistanê, roja 24ê Hizêranê, hilbijartinên serokomarî û Parlemento hatin pê. Di encamê de, di tûra yekem de, Receb Teyib Erdoxan posta serokomariyê bi dest xist lê partiya wî AKP, piraniya dengan bidest nexist û nikare bi tena xwe hikûmetê ava bike.

Tevî ku mixain, tevgera Kurdî li Bakurê Kurdistanê nikarîbû di vê cenga aştiyane de rêzên xwe bi yek bikin û dengê gelê Kurd bighînin hemû derên cîhanê, dîsajî HDP, pileya %10 derbas kir û 67 parlementer gihandin Parleman û ji bo tevaya gelê Kurd ew serkeftineke dîrokî bû.

Ji bo propagandaya hilbijartinê, û bi armanca bidestxistina dengên tixumperst û şovenên Turk, Receb Teyib Erdoxan gotara xwe li hember maf û dozagelê Kurd tûj kir û hêzên xwe yên leşkerî şandin Başûrê Kurdistanê û gef li gelê Kurd ê rojavayê Kurdistanê xwarin.

Piştî darbeya ku gelek goman li ser rastiya wê hene, Erdoxan demokrasî, mafên mirov û azadiya ragihandinê kirine astengê. Bi dehê hizaran rikber û dadwer û efserên artêşê ji kar û barên wan bidûr xistine, bi dehê hizaran xebatkarên democrat û mafnas avêtine binê zindanên xwe yên tarî, nûnerên gelê Kurd ên bijartî yên mina xebatkarê navdar Selahedîn Demirtaş û hevalbendên wî zindan kirine, û berê Turkiyê daye aliyekî ne diyar û tu kes nikare encamên.......... 2

# «Efrîn berî her tiştî»

Hejmareke rojnamevan û çalakvanên Efrînî, bi haştaga(#عفرين_أولا) anku 'Efrîn berî her tiştî' kempeynek li ser torên civakî dane destpê kirin.

Kempeyn roja Sêşemê li ser Facebook, Twitter û Instagram destpê kir û wş hefteyekê bidome.

Rojnamevan Ehmed Qitmê, yek ji çalakvanên wê kempeynê dibêje ku ew dixwazin ku gelê Efrînê yê li hindurê bajêr lawaz nekeve.

"E m.......... 3



# Kurd û têgeha guhdarkirinê

**Hekîm Ehmed**



Tiştê ku ev mijar anî bîra min, halê ku em Kurd tê de dijîn û qonaxa ku em tê re derbas dibin e, em tev daxivin, heya bi yê ku na axivin jî, qerebalexê dikin, axaftinekê dubare dikin yan nahêlin kesek dengê yê din bibihîze, wek ku rêkeftinek di navbera me de hebe ku kes ji me li yê din guhdar neke, her aliyek jî xwe bi awayekî xwedî desthilat dibîne (carina dar digire xwe û carina maf dide xwe) û ji xelkê dixwaze ku li wî guhdar bike, lê ne dikare yê pêşberî xwe bêdeng bike û bitirsîne û ne jî dikare kesên derdorê bi axaftina xwe bide bawerkirin, wilo guhdar tine ne, carina yê bêdeng dimîne, ew ji tevan bêhtir diaxive, lê awayê wî di axaftinê de taybet e, wilo jî li ser toreyên civakî li ser enternetê, tu dikarî axaftina piraniya kesan ji (wêne, al û durişman) nas bikî, ew weke straneke wê axaftinê dubare dikin û tiştekî din nabihîzin.

Ji aliyê fêrkerên zimanan ve, guhdarkirin wek gava yekem a fêrbûna ziman li ba mirov tê pênasekirin, çimkî zarokên mirovan berî ku dest bi axaftinê bikin, bi rêya guhdarkirinê dikarin têkiliyê bi kesên derdorê re bikin, wilo bo mezinan jî, di warê fêrkirina zimanekî de, guhdarkirin teknîka destpêkê ye ku reftara zimankarî ya yekem tê dîtin, êdî mirov dikare bi rêya guhdarkirinê bi hemû têgeh û ramanên ku li peyv û hevokan bar bûne agahdar bibe.

Di dîroka Kurdan de, ji ber qedexekirina çand û nivîsên wan, wêje û deqên nirxdar demeke dûvdirêj devokî mane û di nav de jî deqên olî û çîrok û stran, ji ber wê piraniya caran axêver (Axa, mele û dengbêj) bûn û……… 3

**Hilbijartinên... Dûmahîk**

reng siyasetê texmîn bike.

Wekî ji hemû rayedarên cîhanê û dezgehên navnetewî ve diyar e ku Hikûmeta AKP û serokomar, gelek zêdegavî derheqa gelê Sûriyê û gelê Kurd bi taybetî kirine. Û ji ber ku ew li ser gelek wrîsan dilîze, Kirîza Sûriyê ji bo berjewendiyên xwe bikar tîne û tewanên mezin dike ku dagîrkirina EFRÎNê yek ji wan tewan û gunehkariyên ku ticarî nayên bexşandin û ji bîrkirin. Di vê derheqê de, ew di gola nakokiyên dewletên mezin ên cîhanê, nemaze yên Rûsya û Emerîka de avjeniyê dike û çavên gelên Turkiyê ji rastiyê diguhêre.

Her kes û hemû dewletên cîhanê dizanin ku berjewendiya gelên Turkiyê û welatê wî di aştiyê de ye ne şer, pevçûn û cengê bi gelê Kurd re ye. Giringe hemû aştîxwaz û xebatkarên dilsoz jib o tazîkirina vê siyaseta çewt xebatê bikin, û doza Kurdî bi şêweyekî aştiyane li ser masa diyalogê di bin çavdêriyeke navdewletî, li gora belgeyên mafên gel û mirovan di çarçewa yekîtiya welêt de bête çareserkirin.

Digel hemû azar, derd û êşên giran ên gelê Kurd û likumandinên tevgera wî ya siyasî, hêviyên me li cih in ku paşeroj ji gelê me û hemû aştîxwazên cîhanê re ye, û pêwiste ku gelên deverê waneyan ji kirîza Sûrî û Îraqê bigrin û ew bi xwe hev bipejirînin û destên ku agir di welatên wan de tev didin, ji welatê xwe bavêjin, ji ber ku bi şer û rijandina xwîna mirovan, dozên gelan çareser nabin.

Bi navê desteya NEWROZ ê, em gelê Kurd bi serkeftina HDP pîroz dikin û bi hêvî ne ku ew ji me re bibe pêngavek nû bo lihevkirin û yekîtiya gelê me yê berxwedêr.

Bi vê boneyê, kek Miheydîn Şêx Alî/Sekreterê Partiya me(PYDKS) pîroznameyek ji hevserokatiya HDP ê re hinartibû, ev deqê wê ye:

## Pîrozname

*Ji hevserokatiya HDP re….*

*Xanim Perwîn Boldan …*

*Rêzdar Sezayî Temellî…*

*Silav û rêz…*

Serkeftina partiya we di helbijartinên parlementoya Turkiyê de, li 24.06.2018 ku, benda 10% hate derbaskirin, ciyê pîrozbahiyê ye, û şahî xiste dilên Kurd û hemî demokratan.

Cefakêşî û fedekariya dost û hevalên HDP, li beramber ewqas zordarî û setemkariyên li dijî hebûn û rola we, berhem da û rê li ber domkirin û geşkirina xebata we ya rewa û dadmend fereh kir, ewqas jî berpirsiyartiya HDP mezin kir.

Careke dî em HDP pîroz dikin, hêvî û bawerî li cî ne ku, partiya we li seranserî Turkiyê, her dê di têkoşîna xwe de, bona Aştî, Azadî û Wekheviyê li pêş û navnîşana herî navdar û pîroz be.

*26.06.2018*

**Bimînin di xweşiyê de**

**Birayê we**

**Mihyedîn Şêx Allî**
**Sekretêrê partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

## Kurd û têgeh... Dûmahîk



li aliyê din jî guhdar (Cotkar, bawermend û bihîzer) bûn, bi hevbeşiya her du aliyan, têkilî û parvekirina civatê yan şevbuhêrkê saz dibû. Di vê têkiliya ku di civaka Kurdan de bi rêve diçû, tim desthilat dida axêver (Axa, şêx, mele, cendirme, dengbêj..), di nav wan de tenê ya qels, desthilatiya dengbêj bû ku bi dema stranê ve sînordar bû, ango kesê daxive yasa û ferman û şîretan dike û yê guhdar -eger bi kêfa wî be yan na- divê erê bike, bêdeng bimîne, ew dikare erêkirina xwe jî bêdeng bide nîşandan, weke dema serê xwe bi pêş de bihejîne yan jî hew peyveke erêkirinê bibêje.

Bêguman, ew bêdengiya guhdaran ku gelek caran bi darê zorê berdewam dibû, ne rewşeke normal bû, lê helbet gotina (Na) jî piştî guhdarkirineke baş dihat, ku carina wê (Na)yê şoreşek derdixiste holê.

Di serdemeke din ji jiyana civaka Kurd de, her partîzanekî li berpirsê partiya xwe guhdar dikir, ew gotin ezber dikirin û wî bi xwe li cihekî din an civateke din bi dubarekirina heman gotinan rola axêver pêk tanî, lê dîse jî tiştek ji serê xwe nedigot, ango ew bi axaftina xwe re jî di post û cihê "guhdar"de dima, di heman demê de wî li kesekî din jî guhdar nedikir, ango wî heya bi mafê xwe yê guhdarkirinê jî radestî wî berpirsî kiribû.

Mebesta min ji vê şiroveya derbarê çanda guhdarkirinê di dîroka civaka Kurd de ew e ku giringiya guhdarkirina durist di dema niha de bidim ber çavan.

Ji bilî sûdeyên guhdarkirinê yên têkildariyê û fêrbûnê, aliyê rêzdariyê jî heye, dema ez li kesekî guhdar dikim, ez danpêdanê didim wî wek kes, wî wek xwe dibînim û bi vî rengî ez ji wî jî dixwazim ku li min guhdar bike, lê eger ez rêzê ji hizr, bawerî, hest û ramanên wî re negirim, helbet ew jî min hêjayî guhdarkirinê nabîne, çiqasî ew nezan be yan zarok be jî û çiqasî ez nerînên xwe rast bibînim jî, ez hewceyî wî me, çimkî ez dixwazim ku ew rastiyê nas bike.

Axaftina bi agahiyên durist û nirxên bilind zengîn be jî hewceyî vê rêzgirtinê ye, eger mamoste, bav, berpirs û rayedar ji mirovên xwe re dilsoz û rêzdar bin bi guhdarkirinê û derdê wan bibihîzin û binasin, dê bikaribin ku guhdaran peyda bikin û li dor xwe kom bikin bêyî ku hewceyî darê zorê û dengê bilind û xapandinê bibin.

## Efrîn berî... Dûmahîk



« Artêşa Turkiyê di kolanên Efrînê de »

dixwazin ku gelê me bizane em bo êşa wan hestiyar in û em hewl didin bi rêyên cuda alîkarîya wan bikin û cîhanê hişyar bikin.“

Qitmê dîyar kir ku yek ji armancên wan jî rewşa xirab ya ya çapemenîya li hindurê Efrînê ye ku rojnamevan nikanin bi serbestî bixebitin.

”Em dixwazin rêxistinên navdewletî yên alîkarîyê û ragihandina azad derbazî Efrînê be da ku ji nêz ve rewşê bişopînin û bi erka xwe rabin.“

Di armancên kempeynê de boykotkirina kesên ku Tirkîyê û komên tundrê li şûna Efrînîyan bi cîh kirine jî heye.

”Kesên bîyanî ku li Efrînê hatine bi cih kirinê, divê werin boykot kirin û ne civakî û ne jî aborî, ti têkilî bi wan re nebe.“

Qitme da zanîn ku ew dixwazin revendên Kurd yên li derve vexwînin xwepêşandanên xwe.

Endezyar Vîyan Reşîd jî dibêje ku di rewşa Efrînê de, ku ragihanidn nikane bûyerên diqewimin bişopîne, torên civakî wek ragihandineke alternatîf dikane tiştên wek kuştin, destdirêjî, dizîn ji cîhanê re eşkere bike“.

Hêjayî gotinê ye ku ev kempeyn piştî derbazbûna pirtir ji 100 rojî di ser desteserkirina Tirkîyê û komên tundrê yên pêre ji Efrînê re tê.

# Partiyên Kurdî û hêviyên miletê Kurd

**Nûşîn Bêcirmanî**


Efrîn di bin dagîrkeriya Tirkiyê de ye

Di mejî û ramanê her kesekî kurd de , eve pirsa sereke û giring diçe û tê!....

gelo partî û serkirdeyên van partiyan li hember hêvî û daxwazên gelê kurd bi dilsozî radiwestin an na!??

Partiya ku xwe li hember gel û helwestên wî berpirsyar bibîne, divê nêzî daxwaz û pêdiviyên wî yên dûr û nêzîk be, ta ku bi rastî navê partiyeke kurdî û berpirsyar lê bête kirin..

Di rewşa miletê kurd de li rojavayê kurdistanê – û li parçeyên din jî wilo - dermanê pirsgirêka miletê kurd û çareseriya wê, yekrêziya çarçew, partî û dezgehên civaka sivîl e.

Bê goman ev yekrêzî di gelek qonax û qeyranan de jî, hatiye pêkanîn, miletê kurd sûde jê wergirtiye û bûye çareserî ji hilanîna gelek kelemên ku di pêşiya xebata gelê kurd de dihatine çandin, lê mixabin ew yekrêzî pêşneket û berdewam nekir, berûvajî wê, yekrêzî – di bin çi navî de be - rawestiya û tune bû, hate jibîr kirin û bû navek ji dema bûrî, partiyên kurdî dîse vegerehan rewşa xwe ya berî yekrêziyê û êrîş, nakokî di navbera wan de gur bûn, ne ji bo berjewendiyên gelê kurd, lêbelê ji bo bazar û nakokiyên xwe yên kesane û partiyane bi tenê.

Îro li rojavayê Kurdistanê, miletê kurd û xaka wî di bin gef û metirsiyê de ne , nemaze piştî dagîrkirina xaka bajarê zeytûn û kurdayetiyê, Efrîna rengîn, ji bal rijîma Tirkiyê ya şoven û çeteyên olî û terorîst yên pê ve girêdayî, û gefên ku rojane li ser heremên din ji rojava û bakurê Sûriyê têne dan. Milet bi yekrêziya kurdî rêça azadî û çareseriyê ji pirsgirêka kurdî re dibîne, wilo jî rêzdariya wî ji partî û çarçewên kurdî re bilind û zêdetir dibe, hêviyên wî geş dibin. Ji hêla din ve li bal dost û xêrxwazên doza kurdî ciyê şanazî û dilxweşiyê ye, di heman demê de ji dijmin û xêrnexwazên gelê kurd ciyê xemgînî û dilsariyê ye.

Pirsa ku di bîr û mejiyê her kurdekî de bersivê dixwaze ew e, gelo ev rêxistinên kurdî li gorî hêviyên gelê kurd in û wê yekrêziya xwe bikin ....?! xwesteka sereke ya miletê kurd ji partiyên wî yekrêzî ye, lê mixabin kar û kirdeyên partiyên kurdî neyekrêzî, lê parçebûn e!.....

Xala din ya ku milet ji partiyên xwe hêvî dike, ku bi hev re demokrat bin, di heman demê de bi milet û saziyên civaka sivîl re jî demokrat bin...Giringe em werin li firaza karê wan temaşe bikin.....

Piraniya partiyên tevgera kurdî, tuşta di navbera wan de hevbeş gotina (DEMOKRATÎ) ye, lê mixabin ya ku wan bi hev ve girêdide nedemokratî ye, her partiyek xwe bi tenê rast dibîne û karê ku dike ewe yê rast û durist, ewe nûnerê rewa yê miletê kurd e, wêlomê tu kesî bi xwe re nabîne.... Her partiyek mafê xwe dibîne û dide xuyakirin, lê tu mafan ji kesekî din re nabîne weke xwe, ji hêla din ve erkê her kesî dibîne lê wî erkî li ser xwe pêknayîne...

Gelek ji wan hînî demokratiyê nebûne, ew dibînin ya giring ku gotina demokratî di navê wan de hebe, jibîr dikin ku demokratî pîş, kirde û bikaranîn e, berî ku nav û silogan be. Nama demokratiyê ya sereke diyalok e, ango tu yê li hember xwe bibîne, rêzgirtinê ji nerîn û helwestên wî re bigre, li civaka xwe guhdariyê bike, sûdê ji nerînên cuda û ciyawaz bibîne.... û H.D.

Berûvajî vê , partiyên me, weke hêz, hev nabînin, ku xebata tevan ciyê rêz û hurmetê ye, û hev temam dikin.... giha asta rûniştina wan bi hev re, gunehekî mezin dibînin, û jê baz didin.... çênabe li hev rûnin û diyalokê bi hev re bikin, yek yê din nabîne ku pê re rûne...Û her yek ji wan jî demokrat û bavê demokratiyê ye.!

Em demokratiyê bi reng û şêweyê şaş û çewt bikar tênin, Partiyên me , partiyan çêdikin, her demekê partiyek tê ser masê, da di karên hevbeş de – eger bibin- her partiyeke mezin çendeke biçûk bide dora xwe, ji bo di standina biryaran de ji dengê wan sûdê werbigre , li ser asta netewî kurdî li Sûriyê, da nerînên xwe bibin serî, tevî ku ew nerîn ne di xizmeta gelê kurd û çareseriya pirsgirêka wî de be jî.

Bê goman bi demokratiyê yekrêziya kurdî tê û bicî dibe, bi wan herdiwan gelek ji pirsgirêk û nakokiyên tevgera kurdî, çareser dibin , wilo rê li pêşiya tevgerê û milet dûz û hêsan dibe, wilo jî her kes ji doza gelê kurd re, dibe xwedî û leşker.

# Berjewendiyên Dewletan Û Mafê Mirovan

**Nazdar Hesen**



Ji ber ku hertim mirov bi destê mirov tûşî cîwazî û nijadperestiyê hatiye, neyartî û dijîtî di nav wan de peyda bûye û di dermafê hevdu de sebaret, rût, qir û hatî cînosayîd kirin, ji ber wê û ji bo ku mafê mirovan were parastin piraniya dewletan peyman danîn û bi sedan komele jî ava kirine, da ku li seranserî cîhanê , mafê tu kesî netê dehandin û ji maf û rûmeta hemiyan re rêz were girtin . Ji ber vê yekê jî, Netewên Yekbûyî li sala 1947an belgek derxist û li ser hemî dewletan belav kir û ji wan xwest pê pabendî bin, û dît ku binpêkirina mafê mirovan tewan û ceza ye û divê yên pê radibin werin darizandin ''dadgehkirin''. Lê mixabin , tevî ewqas kar , bar û cefakêşiya di vê derbarê de hatine kirin ji wê salê de û heya roja îro , mirov heroyî li pêş çavên hemiyan û bi herawî tûşî kiryarên kirêt û hovane tê, bi taybet di cih û warên tê de ceng dibin, ev kiryar û binpêkirina mafê mirov û têkçûna mafê jiyanê bêtir e . Lê yê seyr''mat'' ew e, ku ev dewletên her roj navê mirovperwerî û demokrasiyê tînin ziman û hertim bi mafê mirovan daxivin û serweriya cîhanê tev dikin, li pêş ewqas zêdegavîkirin, ceng û qeyranên dewleta Tirk û pêgirên wê çeteyên radîkal di dermafê me Kurdan de li bajarekî biçûk wek bajarê Efrînê û dagirkirina wê bi darê zorê , bi balefirên cengî û hemî çekên giran wêran û talankirina malan , kuştin û koçbarkirina hezaran, mixabin, ev dewlet bêdeng dimînin, ji wê bêtir jî di paytextên van dewletan de di dermafê me de tawan dibin, çi yê li Viyana di dermafê Ebdil Rehman Qasimlo û Şerevdîn Kindî de bûyî û çi yê li Parîsê di dermafê her sê têkoşerên Kurd Sakîne Cansiz, Leyla şaylemez û Fîdan Dogan de bûyî, bêyî ku heya ev tewana were zelal kirin û şopandin û ta niha piştî çend salan hêjî dadgehên wan bê sûd didomin, kujer û gunehkar jî serbestin û nehatine darizandin . Ma gelo ev dewletên serwer me Kurdan weke mirov nabînin, an tu tişt ji destên wan dernakeve an jî ew di van cirm û cengan de hevparin? Belê, mixabin di helwestên van dewletan de dirûtî û dijîtî diyar e, ew xwe bi diruşim'' silgonên'' mirovperweriyê dixemlînin, lê tucarî mafê tukesî ji wan re ne pêwîst e û li gor berjewendiyên xwe destûran pêktînin û piştgiryê vî yan wî dikin, wisa jî di bazarên van dewletan de mafê pir gelan bêtir winda dibe û eger ev dewletan di vê siyasetê de bidomin û li gor zagon û destûrên danîne, xwedî der nekevin wê aştî û ewlehiya cîhanê bi temamî têxe metirsiyeke mezin, tevlehevî wê peyda bibe û pêkvejiyan wê têk biçe.

# Di bîranîna Roja zimanê Kurdî de
# Zimanê me, nîşana hebûn û rûmeta me ye

**Newafê Bişar**




Roja 15ê Gulana sala1932an, li paytexta dewleta Sûriyê(Şamê), yekemîn car di dîroka gelê Kurd de, û li ser destê mîrê Kurd ê payebilind û navdar Celadet Alî Bedirxan kovarek bi zimanê Kurdî, bi elfabeya Kurdî ya latînî û navê HAWAR tê çapkirin û belavkirin. Û ji sala 2006an û vir de, ew roja pîroz bûye Roja Zimanê Kurdî û tê pîrozkirin.

Bi derçûna Kovara HAWARê, qonaxeke nû li pêş ziman û wêjeya Kurdî hatiye vekirin, bi sedan welatparêz û Kurdhezên dilsoz bendewarê HAWARa xwe bûne, ew hembêz kirine, bi dilgermî xwendine û dane xwendin. Ango, HAWARê şadî û şahî xistiye dilên hemû kurdperwer û xemxurên welêt.

Ma dê çawa ew ê bi HAWARê serbilind û bextewer nebin wekî mezin û bîrewerên Kurd ên gewre yên mîna Celadet Bedirxan, Dr. Nûredîn Zaza, Apo Osman Sebrî, Qedrî Can, Seydayê Cegerxwîn û Mela Ehmedê Namî …û hwd xweştirîn gotar, folklore, helbest û çîrok xweş tê de belav dikirin?. Ma kîjan Kurd ê çîrokên Nûredîn Ûsiv(Nûredîn Zaza) mîna "Stêrk" û yên Qedrî Can mîna"Tayek porê spî" xwendibe, yan gotarên ramyarî yên Herekolê Ezîzan(Celadet) yan jî gotar û helbestên Osman Sebrî xwendibe gelo ew dikare bi HAWARê ve neyê girêdan.........

6

# Tiştên Ne Di Bîran de

**Mihemed Qere Hesen**



Radibû baştûnê çarengî dikir dest xwe, û berî dida mal. Serî rengê xwe ji berfa pozê ciyayê Gerwir biribû, geh mijê weke kêserewanek hevrîşmî sipî bi nermî xwe lê digerand û ji şewata germa havînê diparêst, geh jî royê destê xwe di ser re digirt, û dilopên berfa avlî mîna tenên xişirên zelal jê dadirivîn, û xû ji wan dilopan bi hev diket, û digeliyên kûr ku demên har li rûyê wî çêkirine re diherikin, hin caran diketin çavan û ji eksîrê pirtir dişewitand û dîtin ji ber çavan bereşî dibû, destmal ji berka xwe bi derdixist û pê pak dikirin. Û riyê weke hiriya berxikan li navkê diket. Ew hin caran rûdinşt, û dest li ber eniya xwe dikir refik, û bi wan çavên weke tenên tiriyê balûzim li paş xwe dinêrî, ku bihnekê bikşîne û vehese û bi xwe re digot: ‘’ Mirov cûkekî bê basik e ‘’. Radibû rî dikirin devê xwe, û carek din hêz dida xwe, û di rêya kaşê jiyanê re hildikşî, bi westîn û hilkiş hekaheka xwe gihêşte ber deriyê xanî, berî ku derî veke, kutkekî zêtûn î hişk li wir bû, kir bin serê xwe û xwe dirêj kir ku vehese, lê ew ji xwe hay nebû di xew ve diçû. Ew li hespekî kumêt siwar dibû, û li nava bajarê Helebê digerî, rastî qesrên wê dihat ku hemiyan serî kirine hev û hêstirên ziya ji çavan diherikîn, piş xomir, qoq û vîlkî bûne, û xwe dane ser baştûnên xar û şikî. Gava yekî pufêkira dililikîn, û tirebzonên wan bûne guhar û pêve hêldibûn, ji ber deng û tirsê guh ker bûne û zaravên dilên wan qetî bûn, û mangê di paş ewrekî ji kilxan û dûyê çekên giran de xwe veşartî bû. Hespê wî jî xwe di ser lodên kevir û axê re davêt. Û berê xwe dida bajarê Hemê û ji ber rehitbûnê diçû li ber çemê Asî li rex firfirkên avê yên texitî dadinişî ku vehese. Lê, wan jî bi herikandina avê re çêroka bajarê Hema hewaldida, û gewriya Îbrahîmê Qaşoş bi ser avê ketibû, awzên xwe tev dengê herkînê dibû, û bi hev re strana azadiyê digotin. Lê hespê tî ji cihê rabû berê xwe dida Şama şerîf, Şama şewitî. Di ber serê şêx Ehmedê Niqişbendî û Ûsibê E›zma re der dibû, didît ku herduyan kolos ji serê xwe danîne û digrîn. Vê pirs berê xwe dida bihişta Şamê ‹›Xota rojhilat ‹’ , li wir çiqas gul û kulîk hene devên wan bi hevdên riyê têlî yên zingarî hatine dirûtin, û hêsp xwe di ser komên laşên zarok, jin, kalepîr, gul û kulîkan …re gav dikir, û bihna wî ji ber Siyenîd û Xerdelê teng dibû, û li wir direvî diçû Der’a, û bi Hemzeyê Xetîb re li cûckê wî digerî, ku tofê xwe winda nebe. Hespê kumêt û resen di ser Hesenpirçoyê libnanî re gav dikir, û diçû bi Alan re li binê derya Sipî li tenbûr û lîstoka wî digerî û devê wî ji qûmê pak dikir. Lêhay bû, ku tiştekî bi nermî li henarîkên wî dikevin. Wî çavên xwe vekirin, tavilê mat dima. Didît, ku xwîna pakrewanan herikiye bin kutkê zêtûnê yê di bin serê wî de ji nû ve şiqin daye, pelên ji ala rengîn ketinêye û siha xwe daye ser wî, eyarê pîr hilîs bûye û ji nû ve ciwan bûye, û wî jî zend û bendên vemalandin û berê xwe dida welatê royê.

27.8.017an

**Roja Zimanê... Dûmahîk**

benda derçûna wê nemîne?!..


Yên ku her 57 hejmarên HAWARê xwendibin, ew baş dizanin bê Mîrê me û hevalbendên wî çendî westan û cefa kişandine, berhem û mijarên bilind di warê raman, dîrok û hemû beşên wêjeyê de bi şanazî pêşkêşî gelê xwe kirine.

Di vê bîranîna giranbuha de, Roja Zimanê Kurdî pîroz be, hêvî û omîda me ew e ku paşeroj ji gelê Kurd û zimanê wî re ye, û bila pênûsên nivîskarên me yên rêzdar û dilsoz her di rajeya gelê xwe de bixebitin, tevî hemû êş, derd û kulên giran jî, em hêviyê di civakê de biçînin û geş bikin, em çanda hezkirin û ji hevhezkirinê biweşînin û ji çanda tund û belavkirina kînê di civakê de bidûr bikevin û wê pûç bikin.

# Mirina min jiyan e

*Helbestvana Emazîxî Semîra Hesen/ Tûnis*
*Wegerandin ji Erebî : Nûşîn Bêcirmanî*

Dema mirin û pakrewaniyê ye
Yasemînek ji mirinê re diyarî ye
Û stranên evînê yên xemgîn
Demsalên min tev payîz in
Ji şahiyê re her êvar
darbest hene
dilekî bi hêviyan tij e
kulîlkeke evîndar bê kene
di hemû êvaran de
em miriyên xwe dibin
maçek li derdora min digere
û liser enya pakrewan bicî dibe
hêvî tev xuyabûn
xwen gerim bûn
digel barênê
digel rondikan
digel mirinê
buharê veda
ji dûr veda
bi demê dorpêç e
bi xiniziyê dorpêç e
bi tunebûnê min
sirûda welat rist
û ji giyanê yasemînê re
min awaz gotin
ji rewanê welat re
helbest mi ristin
helbest penageha min bû
û tu weke ezman mezin bû
diyarkirina min demsalên baweriyê ne
xwena min sirûda serxwebûnê ye
xemgîniya te tajanbazê min bû
ar û pêt bû
her ro roj dihile
ba ewrên reş dibe
xecxecok divebin
sura Newrozê gel kom dike
meşxela azadiyê ronak e
bi arê şahiyan



ezê zordaran bikewênim
vane cejin û dezgîran hatin
qîzeke kurdî hinekirî me
û tu, tu li wir cendekî
bê darbestî

---

**Ebdilezîz Fer... Dûmahîk**

ne:
Êdî Bes e
Gelek şevê reş û tarî
Me bûrandin bi diljarî
Pirsgirêk û qeyran me dîn
Dîsa em man li vî warî
Me baz neda ji niştiman
Me rê neda wan dijminan
Çima îro xortên çeleng
Ji xaka xwe teva berdan
Wa pêşmerge li serê çiyan
Ala sê rengînî hildan
Li sengerê şer û xebat
Diparêzin xaka welat
Doza serxwebûnê dikin
Li van rojan demek pir kin
Navê kurdan li nav netewan
Bi serbilind belav dikin
Xwe nedin paş ji xebatê
Cotê xwe bib serê latê
Nêvcî nehêl vê armancê
Bi par nemîn ji xelatê
Şerê hevdû êdî bes e
Nema bikin pise pis e
Kurdistana Başûr hels e
Azadî ye bo her kes e
Ev bû sedsal her Berzan in
Navnîşana niştiman in
Mam û Apo li gel wan in
Milet hemî fîdacan in.

---

**Ehmed Zemçî... Dûmahîk**

watedar û balkêş pêkêşî beşdaran kir. Paşê , birêz Elî Cefer ji beşdaran aşkere kir ku gorbihuşt û hevjîna xwe, hemû mal û milkên xwe diyarî pêşkêşî “Enistîtuya Kurdî li Parîsê” kirine. Paşê, li ser navê malbatê, birêz Dr Mihemed Berekat, sipasiya beşdaran kir. Û kesayetiya Kurd a naskirî birêz Apê Cimo jî li xebat û sinciyên wî axivî û sersaxî ji malbatê re pêşkêş kir.

Herwiha, li ser navê(PYDKS) birêz Hebîb Ibrahîm kurte-gotinek pêşkêşî beşdaran kir, bal kişande ser kar, xebat û wefadariya wî ji doza gelê wî ya rewa re û got ku, koçkirina wî ji gelê Kurd re ziyaneke mezin û bûyereke xemgîn bû. Ji aliyê xwe ve, nivîskar û zimanzanê Kurd birêz Mamed Cimo da zanîn ku, gorbihuşt ji xebatkarên Kurd e ku, dîroka Kurdistanê zengîn kirine û ew ti carî nayê ji bîrkirin, herweha ew yek ji wêne û nimûneyên çiyayê Kurmênc yên geş û ronak in.

*(*) Rojnameya EL-WIHDE hejmar/297/-Hizêrana 2018an.*



# Dr. Ehmed Zemçî Feyo

# Çû ber dilovaniya Xwedê *



Sala 1928an, li gundê Kersanê-Herêma Efrînê, Ehmed Zemçî yê Feyo ji dayik bûye û sala 1943an, li Efrînê, dibistana seretayî (Sinifê 5an) bi dawî dike û diçe bajarê Helebê, li wê derê, sala 1950î, lîseya bekalorya werdigre û ji bo bidestxistina zanînê û xwendina bilind, berê xwe dide Turkiyê, li Istanbolê fakulta bijîşkiyê dixwîne. Lê ji ber xebata wî ya netewî û çalakiyên wî, tevî ku ew di salên dawî yên xwendinê de bû jî, dezgehên ewlehiya dewleta Turk ew ji zanîngehê bidûrxistin.

Neçar dibe, lê ew ji desthilanîn nekeve û dev ji xwendinê bernade. Radibe berê xwe dide welatê Almanya û mîna yekemîn xwendekarê Kurd ê herêma Efrînê, li sala 1955an dibe xwendekarê zanîngeheke Almanî û xwendina xwe didomîne. Li wî welatî, ew li gel jineke Almanî malekê ava dikin, lê mixabin ku ti zarok ji wan re çê nabin.

Bi dehê salan ew karê bijîşkiyê dike, lê ew welatê xwe ji bîr nake û her girêdayî dar, çiya û zeviyên wî dimîne û car bi car serdana welatê bav û kalan dike. Ji bilî vê yekê jî, wî alîkariya gelek koçberên Kurd li Almanya kiriye.

Ehmed ê zîre û çalak, di gel birek ji xwendekarên Kurd ên dilsoz, "Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa" dadimezrînin û ew beşdarî kongreyê wê yê pêşîn-1956an- dibe, û -li gora hevpeyvîneke wî bi birêz Elî Cefer re- ew weke serokê komelê tê hilbijartin.

Roja 4ê Hizêranê, li bajarekî nêzîkî AXINê, dilê mezin ê Dr.Ehmed Zemçî radiweste û xatirê xwe ji dinya gewrik dixwaze, diçe... Roa 112018/06/an, bi beşdariya gelek dost, heval û hin kesayetine Kurd û Alman wî dispêrin axê û xatirê xwe yê dawî jê dixwazin.

Di rêwresma veşartinê de, mirovekî Almanî gotareke.......... 7

# Dr. Ebdilezîz Ferman

# Ji nav me barkir

Roja 2ê meha Hizêranê, piştî berxwedaneke bi derd û êş bi nexweşiya pençeşêrê ya malwêran re, li bajarê Qamşlom, dilê mezin ê mişt evîna ziman û

Ew xwediyê nexweşxaneya FERMAN a navdar bû ku di bûyerên xwîndar ên Qamişlo sala 2004an de deriyên wê ji xortên Kurdan re vekirê bû, bi dilovanî ew henbêz û derman dikirin.

Gorbuhuşt, mirovekî diltenik, hestiyar, pevxweş û helbestvan bû. Û ji ber evîna wî ji xak û gelê wî re, tevî hemû tengasiyên jiyanê, wî nikarîbû terka welêt bike û jê dûr bikeve, ta dawia jiyana xwe di nava gelê xwe û ser xaka bav û bapîran ma û li welêt, li gundê ku yekemîna car ronahiya jiyanê lê dîtiye, Çaxirbazar a ku sala 1944an lê ji dayik bûye, hate veşartin.

Û ji ber ku ew yek evîndarên zimanê dayikê bû, du dîwanên helbestan afirandine. Ya pêşî bi sernava"Dûriya Welêt" bi navê xwe yê nehênî C.Salar, ku rewşenbîr û xebatkarê Kurd ê navdar Dr.Nûredîn Zaza pêşgotina wê nivîsandiye. Û ya diduwan jî bi sernava"Evîn li welêt" ku nivîskarê Kurd ê dilsoz Rezoyê Osê pêşgotina wê nivîsandiye weşandiye.

Li ser dîwana wî ya pêşîn, Dr Nûredn Zaza wiha dibêje:

" C. Salar bi xwe kurdekî ji kurdistana bindestê Sûriyê ye, xwendina xwe ya nizim li wê qedandiye, pişt re ji welat derketiye û hatiye Ewrupa û bi xwendina xwe ya bilind ve mijûl bûye. Nih ew ji me re bûye doxtorekî hêja û giranbuha û li benda dermankirina birîndarên welêt e.



Wek xortekî jîr û dilsoz wî hem xwendina xwe pêk aniye, û hem jî wek welatparêzekî xwe bi doza rêzgarî û gerdenazadiya gelê xwe ve mijûlandiye û di nav rêzên têkoşîna siyasî ya kurdan de cihê xwe wergirtiye, ew heta niha ji xebata xwe ya siyasî ji bo serfiraz û serbilindkirina gelê kurd didomîne

Çeliya Pêşîn 1977».

Cihê te bihuşt be bijîşk û helbestvanê dilbirîn, bila serê malbat, dost, hezkerên te û gelê Kurd sax be.

Li dawiyê, ev hin helbestên wî.......... 7

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**